

KURDTIYA MÎREKIYA MENTEŞAYÎ YA KU BERÎ OSMANÎYAN LI ANADOLUYA ROJAVA DEWLET AVAKÎR (II)



(dewama beşa yekê)

Murad Ali Ciwan

DI ÇAVKANIYÊN BÎZANSIYAN DE KURD

Nexwe, hê ji nivê duyê yê sed sala 11-ê pê ve di cîhad û fethên nav erdên Romayê, di zeftkirina gelek kele, bajar û deveran de hebûna kurdan û rola wan qet ne ecêb e. Di van qonaxan de, gava dîroknivîs û buyernivîsên Bîzansî yên wê demê behsa bizav û karên mîrên Kurdan kirine, ew ne wek Tirk yan Tirkmen, lê wek mîr, fermande û serok civakên Persî/Îranî destnîşan kirine. Herwekî dîroknivîsê Bîzansî Georges Pachyméres û Nicheporus Gregoras yên ku buyerên dewra jiyana xwe nivîsîne û Paulus Aeginete yê ji katiben Dêra Johannesê ya Ephesusê (Efesê), gava behsa buyerên ku Menteşa Beg, Sasa Beg û Alîşêrê Germiyanî kirine gotina “Persî” bikaranîne. Ji hin tekstên Grêkiya kevn ên van kesan ku Paul Wittek jî di berhema xwe ya bi navê *Menteşa Beyliği (Mîrekiya Menteşayîyan)* de dane, ev tê dîtin. Gava rojavayîyan di sed sala 18-ê de ew tekstên Grêkiya kevn wergêrane ser Îngilîzî an Fransî jî wek “Pers/Persî” wergêrane. Osmanî û Tirkên ku bi durustî ji wan wergerandine jî gotine “Persî” an “Îranî”, lê yên ne durust ji ber xwe ve avêtine gotine “Tirk/Tirkmen”.

Romayîyan giring dîtiye ku cîranên xwe yên rojhilat yên ku bi salan di bin çengên hev de bûne, ji nêzik ve naskirine û seranserê dîrokê li gel wan di nav peywendîyan de bûne bi eslên wan ên etnikî bi nav bikin; wek Pers, Turkmen, Tatar (Moxol) û hwd. ew ji hev cuda kirine. Lê Xaçparêzên wê demê, bazirganên Cenevizî û Venedîkî, Frenkan ji ber ku xanedaniya Selçûqîyan a serdestê wan welatan bi eslên xwe Tirkmen bûne, hemû mîr, beg û civakên ser bi vê dewletê ve wek Tirk/Tirkmen bi nav kirine. Dîroknasên îdeolojiya resmî ya Cumhûriyeta Tirkiyeyê jî ji vê derê tevlîviyane, xwe avêtine bextê îdiayên ku ev hemû beg, mîr, mîrekî, xanedanî û civak xwedan etnîsîteya Tirk in. Ev, helbet wek beşek ji siyaseta tirkkirina Anadoluyê û Tirkiyeyê bi vî awayî hatiye.

Hin dîroknas û tirkologên hemdem yên Ewropî yên tevî ku di berhemên xwe de cih didin metnên Bîzansîyan yên bi eşkereyî Persîtiya beşeka pêkhatayên wê demê destnîşan dikin jî, ew vê didin aliyekî. Mixabin, Paul Wittekê Avusturyayî jî di xebata xwe de carina bi vî awayî dike. Tevî ku ew rasterast dinivîse ku Pachyméres nivîsiye “yên Pers”, tîne wê maneyê ku “guh

mede vî aliyê meselê, ew Tirkmen bûn”. Yekî wek wî yê ku gelek bi xurdekarî û hesasî li ser buyeran û belgeyan radiweste, çima di mesela taybetmendîya etnikî ya van pêkhatayan de ew qas xemsar e, balkêş e. Her bi vê xemsariyê, tevî ku wî hay ji Hecî Bahadîne Kurdî heye, navê “*Menteşa*” dinivîse û eşkera îşaret dike ku “*Menteşe*” gotineka gelek nuh e jî, Kurdbûna wan daye aliyekî û ew wek Tirkmen dane nasîn.

Li vir, di cih de ye ku bal bê kêşan ser gotina “*Tirkmen*” bi xwe jî. Oxuz, gava hê di destpêkê de, ji warên xwe hatin qewirandin an veqetiyên û wan bi koçberî berê xwe da rojava; Îranê, Azerbaycanê, Kurdistanê, Iraqa Ecem û ya Ereb, “*Tirkmen*” ji wan Oxuzan re hat gotin yên ku bûn Misilman.[1] Lê li dor 150 salan bi şûnde, dema li Anadoluya rojava û navîn erdên bin destê Împaratoriya Romayê dihatin fethkirin û îslamkirin, guhertin di vê maneyê de çêbûn û maneya eşîrên koçer jî lê derket pêş. Ji alî nifûsa xwe ya koçer li Anadoluya rojava yên ku ji wan re Tirkmen dihatin gotin ne ku bi temamiya xwe, bi beşê xwe yê mezin esil-Tirk bûn. Di nav civakê de ne di piraniyê de be jî, beşek hebû jî wan re jî Tirkmen dihat gotin lê bi eslên xwe ne Tirk bûn[2]

Ebu'l Fîda (m. 1331) di kitêba xwe ya cografyayê de, di destpêka sedsala 13-ê de (ji 1204-ê pê ve) îdî ji demografiya xelkên wan erdên ku ji bal Misilmanan hatibûn fethkirin yên wek ji rojavayê Sînopê bigire, tevî Qestemonu, Kutaxya û Denizliyê (Ladik, Laodikea), biçê heta li Deryaya Sipî; Mekkîyê (Fethiyê) hemû wan erdan, agahiyên ronahîder yên nivîskarekî Ereb yê bi navê Îbn Saîd radigihîne.[3] Li gor Ebu'l Fîda, Îbn Saîd qeydeka wiha daniye ji bo nifûsa Misilman ya vê deverê: “*Tirkmenên ku pîrraniya xelkê wê ji neslên Tirka ne*, di dema Selçûqîyan de beldeyên Rumê fetih kirin. Êrîş birin ser mensûbên Xeraîteyê[4] yên cîwarbûyîyên li peravan, kirin adet ku zarokên wan birevînin, bifroşin Misilmanan. Li nik wan xaliyên Tirkmenan yên tê hinartin bo hemû welatan hene. Li peravê xelîcek heye ku navê wê Mekkî (Fethiyeya nuha) ye û ji bal hemû gerokan ve tê nasîn. Ji wê derê jî bo Îskenderiyeyê û cihên din kereste tîn şandin. Çemekî kûr û mezin diherike vê xelîcê. Tê gotin wek Çemê Battal hatiye nasîn.[5] Tê bahskirin ku di dema Emewîyan de vî navî (Battal) gelek xeza birine ser erdên Rûmê. Li ser çem pirek heye ku tê radan û kêşan, di dema aşîyê de tê danîn, di ya şeran de tê rakirin. Ev, di navbera Misilmanan û Xiristîyanan de hidûd e. Li bakurê Antalyayê Çiyayê Tagurlayê (Denizli) heye. Li vê derê û li derûdora wê qasî 200 000 xîvetên Tirkmenan hene. Yên ûc (serhedî) tîn binavkirin ev in.”[6]

Wek tê dîtin, dîroknas û cografyanasên Misilman jî Tirkmen qismek ji nifûsa Misilman a van deran hejmartine û ne temamiya wan; qismek ji wan wek koçerên esil-Tirk hesabkirine. Nexwe, wê demê di nav koçerên ku ji wan re Tirkmen dihat gotin, civakên Misilmanên ku ne Tirknîjad bûn, ji eslên etnikî yên din dihatin jî hebûn.

Dîroknasê Bîzansî Georges Pachyméres, kesek e ku di dawîya sedsala 13-ê de jiyaye, şer û pevçûnên di navbera civakên Misilman ên wan deverên bahskirî û Romayîyan de, buyer û pêwendiyên navbera wan nivîsîne.

Piştî sefera xwe ya çarê, Xaçparêzan di 1204-ê de paytexta Împaratoriya Romayê Konstantinople (Stenbol) zeft kiribû û Împaratoriya Latîni danîbû. Bîzansî vekîşîyan û wan Îznîk kir navenda dewleta xwe, welatê wan di navbera dewletkokên piçûk ên Bîzansî de dabeş bû. Vê rewşê jî niv qirnekî zêdetir kêşa. Di sala 1261-ê de Bîzansîyan zora Latîniyan bir, Konstantinople rizgar kir û careka din paytexta xwe bir wî bajarî.

Georges Pachyméres jî ji Îznîkê çû li Konstantînopleyê bicih bû. Piştî demekê li navenda Împaratoriya bû xwedan postên giring, li dadgeha Patrîkiyê berpirsiyarî girt, gelek nêzî xanewadeya Împarator û burokrasiya bilind a dewletê bû. Bi berhema xwe ya bi navê *Relations Historiques* di nav dîroknivîsên sedsala 13-ê de cih girt. Di vê berhema xwe de ew behsa buyerên salên navbera 1255-1308-ê dike. Yên ku vediguhêze ew buyer in ku di dema jiyana wî de rû dane. Bi hesasiyet û cidîyeteke mezin nivîsîye, qîmeta agahiyên wî bilind in. Pachyméres, gava behsa pêwendiyên navbera Misilmanan û dewleta Romayê dike, li Anadoluya başûrê rojava; li deverên li ser peravên Deryaya Sipî û Deryaya Egeyê behsa Menteşayîyan û Germiyaniyan jî dike û wan ne wek *Tirk*, lê wek *Pers* dide nasandin. Baş e ku meriv hinekî li ser vê peyvê raweste. Hê berî Îslamê, pêwendiyên Pers-Grêkiyan û Pers-Romayîyan gelek himbiz bûn. Civakên Persî cîranên Grêkî û Romayîyan ên rojhilatê bûn. Di şeran de hin caran Romayî heta Ermenîstan û Azerbaycanê diçûn, carinan jî Persî pêşde diçûn heta Anadoluya navîn; Kapadokya û Kilîkya dixistin destên xwe. Berî Îslamê bi demeka kurt Sasaniyan erdên heta Çemê Yeşilirmakê zeft kiribûn û ev çem di navbera xwe û Romayîyan de kiribûn hidûd, lê paşê ji dest ve berdabûn. Eger em ji vê nêrîngeyê ve

binirxînin, hebûna Persan û helbet wek parçeyekî di nav wan de ya Kurdan dikare bê kêşan paşde heta berî Îslamiyetê. Lê ev dewr ne di nav behsa me de ye û mesele lazim e bi lêkolîn û lêgerînên xurdekarîtir û kûrtir bê zelalkirin.

Lê bi kêmasî dikare bê gotin ku Romayî li gor Ewropiyên din (Frenk, Venedîkî, Cenevîzî û hwd) cîranên xwe yê rojhilatê xwe bi eslên wan ên etnîkî, tarîx û îdareyên wan hê ji nêztir ve dinasîn, teybetmendiyên wan pêkhatayan ên Tirkî, Perstî, Erebtî, Ermenîtî, Asûrî-Suryanîtî hê eşkeretir didîtin û tenê bi eslê serwerên wan nediman, nasname û cudatîyên hê li bin vê serweriyê jî diyar dikirin. Bela ku serdestên wan deveran ên derece yekê Selçûqiyên Tirkmen bûne wan wek Latîniyan û Frenkan giştperestî nekirine û negotîne hemî Tirkmen in. Her wekî di pêwendî û bizavên li ser wan deverên ku di vê xebatê de em behs dikin Persîtiya wan pêkhatayên ku ne Tirk in xwiya kirine. Kurd jî wek beşeka Pers/Îranîyan hesab dibûn.

Ku Bîzansiyên di 1261-ê de Konstantinople ji Latîniyan rizgar kir, giraniya navenda siyaseta wan berê xwe da Balkanan. Bi siriştî, Latîni ew gelek tirsandibûn, wan wek xetereka mezin hê li nêzîk, li Rojava, li Trakyayê hebûna xwe berdewam dikir. Bestî bi siyaseta vegeyriyana ser bi rojava ve, ji hidûdê rojhilatê, yanî ji wê Anadoluya rojava û navîn a ku Misilman hatibûnê, esker hat vekêşan û şandin bo Balkanan. Vê, ji nişka ve, xelkê Xiristiyên ê rojhilatê Împaratoriye li hemberê êrîşên Misilmanan bê parastin hişt. Di ser de ku bacên ji bo xercên eskeriyê û şeran hatin bilindkirin, di nav xelkê de hêseka mezin peqiya, pê re jî tirs û xofekê serî hilda.

Van diyardeyan, li wan deverên ku me buyerên wan ji Ebu'l Fîda veguhaztin jî rûdan, ku li aliyên peravan ên van deveran Menteşayî, li bakur û bakurê rojhilatê wan, li Kutaxya (Kütahya) û Denizlîyê Germiyânî hebûn.

Li serhedan ku eskerên Romayîyan vekîşiyên, warên nuh ketin destê Misilmanan. Pachyméres dinivîse ku xelkê Bîzansî yê li devera serhedan, warên xwe bicîhiştin, derbasî alî Persan bûn, bi wan re hevkarî kirin, rêberî û qilawiziya wan kirin û wiha pê de diçe; "yên dijmin (yên Misilman, Menteşayî û Germiyânî MC) heta nuha tenê bi êrîşên talankerî qayil dibûn, nuha bi saya pêwendîbirrîna xelkê jicî (xelkê Xiristiyên ê Bîzansî) ya bi vî awayî, lingên xwe bi saxlemî danîn ser axa Bîzansiyên." [7] Pachyméresê ku di berhema xwe de Tirkan/Tirkmenan jî gelek caran bi nav dike, fatihên nuh ên van erdan ne Tirkmen lê Pers bi nav dike. Helbet maneyeka vê heye. Çimkî Misilmanên ku ev dever zêft kiribûn ne Tirk/Tirkmen bûn, pêkhate û civakên Persiyayî/Îranî (ku Kurdistan jî beşek bû) bûn, ji wan deran hatibûn.

Li gor Georges Pachyméres, Împarator Michaelê VIII-e di sala 1269 (di çavkaniyê de bi şaşî1296 hatiye nivîsîn) de, di fermandeyîya birayê xwe Johannes de orduyek şand ji bo paşde wergirtina devera Kariayê ya ku piştî 1261-ê ketibû destê Misilmanan, xwestibû bi Persan re peymanekê bibeste. [8] Împarator bi xwe ji bo pesindayîna serkeftinên xwe yê siyasî di biyografiya xwe de wiha dibêje: *Persan li wan deverên dora çavkaniyên Menderesa ku hema hema ji Kariaya jorîn ve Friguyayê qetî' dike û li deverên din xwiya bûbûn. Me ev tune nekirin, ew kirin tabî'.* [9]

Paul Wittek, xwe dispêre Pachyméres û dinivîse ku gava Împarator Michael VIII-ê, di 1278-ê de îdî biryar da, îja di fermandeyîya kurê xwe Andronîkos de orduyekê bişîne Anadoluyê, îdî her tişt bûbû, xelas jî bûbû û vê wergirtiyê jê vediguhêze: "Ji mêjve dawîya derûdora Menderesê, Kariayê û Antiochiayê hatibû. Devera Kaystrosê û Prieneyê, Miletê, Magedonê ji bal dijmin ve hatibû vegirtin. Tralles (Aydîna îro) her çendî hê nuh hatibû tahkîmkirin û iskânkirin, lê kar nuh xelas bûbû ku di 1282-yê de Persan di fermandeyîya wî kesê ku ew di zimanê xwe de bi maneya wêrek wek Salpakîs (Salpaxis, muhtemelen Sahîlbeğî, di çavkaniyê de bi şaşî 'Salkapis' hatiye nivîsîn) tê binavkirin, lê esil navê wî Mentachias (bi Grekî Mantaxias, Menteşa) e, xwiya bûn û wan bajar muhasere kir. Tevî birçîtiya tirsder, bi taybetî tîbûnê, Tralles, axir heta dema bi tevayî ji taqetê ket û xwest bi lihevhatinê (muahedeyê) teslîm bibe li ber xwe da. Lê ya dayî, Persiyên (Di wergera Wittek ev der wek Tirkmen hatiye wergerandin, lê piştê di çend rûpel şûnde de -r. 38- de cardin tê bahskirin ku Pachyméres wek Persî behsa Salpakîs dike) qebûl nekir. Yê dorlêgirtî li ser vê, bi xwe diwarên bajarê xwe bi wî awayî hilweşandin ku ji serkeftiyên re kavlî bimînin, loma jî ji bal wan ve bi bêrehmî hatin şikêrandin. Yê Tirk (rastî divê yê Pers be) cîrana vê Nûsa

(Sultanhisar) jî her bi wî awayî girt. Gava deşta Menderesê bi vî awayî ji dest derdiket, Andronîkos bêyî ku tiştekî bike li Nymphaionê (Nifê) rawestiyabû, temaşe dikir "[10] 1296-ê de sergenerale Împarator; Phlanthrop Alexios gava xwest û teşebus kir ku hukumdariya Bizansê careka din li Kariyê ava bike, Salpakîsê Persî (Σαλπταχι Πέρσου, li vir bi şaşî Σαλαμπαχι Πέρσου –Salampakisê Persî- hatiye nivîsîn) [Mantaxias] ji mêj ve miribû. Jina wî ya bî, ango xanima pêşîn a harema wî, xezîneyên xwe girtibûn hilkişiyabû keleyeka nêzî Melanudionê ya ku bêşik divê li devera Xelîca Latmosê lê bê gerîyan. Alexiosî hevî kir ku bi riya teklîfa pêre zewicandinê keleyê bixe destê xwe, ku jinikê red kir wî kele bi zorê xist destê xwe.[11]

Em li gotina Sasayê Persiyê fermandeyê Mantaxias(yê Menteşayî) li nik dîroknivîsekî Bizansî yê din Nichephorus Gregoras jî rast tî. Ew diyar dike ku Sasa Begê Persî yê Menteşayî hukumranê devera peravê ya ji Menderesê heta Ephesusê ye. Ew wî wek Persiyê ku Ephesus (Efes) zefî kir dinasîne.[12]

Pachyméres jî dinivîse ku her wekî ku berê li Tirelleyê (Aydın) bû, Ephesus jî bi guvaştin û zexta birçîkirinê hat stendin: Her çendî teslîmkirina Ephesusê bi lihevîkirinê bû jî Dêra Johannes hat talankirin, gelek mirov bi tirsê ku dawîya dawîn ew ê tûşî xeterên fetihkaran durustkirî bibin, barkirin Tireyê, yê din pirê wan qirr bûn.

Buyer di nav destnivîsên Paulus Aegineteyê kâtibe Dêra Johannesê a Ephesusê yê ku reviyabû Grîtê jî tê piştrastkirin. Katib nivîsiye ku Ephesusê ku warê jidayikbûna wî ye, ji bal Persiyên di bin fermandeyiya Sasayî de, di 24-ê oktobra (payiza navîn) a 1304-ê hatiye zefîkirin.[13] Nickephorus Gregoras van agahiyên dide: "Piştî ku orduyên Romayîyan ji van deveran vekîşiyên hemû erdên heta deryayê, ketin bin hegemoniya satrapiyên Tirk (Dibe ku li vê derê jî nivîskar Pers nivîsibe wergêran ew kiribe satrapiyên Tirk, yan jî ev bi maneya satrapiyên Selçûqiyên –eyaletên, mîrekîyên Selçûqiyên hetibe-) Tirk piştî ku bi Clergê re li hev hatin, li deverên Asyayê ku demekê ketibûn bin hegemoniya Romayîyan mihacir bicih kirin. Karmanos Alisurios (Alîşêrê Germiyânî), devereke mezin a Frigya ya navîn, erdên ku heta digihîştin Phladelphiyayê (Alaşêhîra nuha), Devera Antiokyayê ya li derûdora Menderesê hemî îşgal kirin. Ji wê derê heta devera ku digihê İzmirê û deverên İyoniyayê yê dîrî peravan (sahîlan) jî yekî bi navê Sarkhanes (Saruxan) girt. Yekî bi navê Sasan (Sasa Begê Menteşayî) dirêjî heta dora Manisayê, Prieneyê û Ephesusê bû, ew der ji xwe re kirin satrapî. Saheya ji Lydiayê, Eoliayê, Misiya Hellepontê, Kalames û kurê kurê wî Karase (Qaresî, Karesioğulları) wergirt. Dora Olymposê û tevayîya Bithyniyayê yekî bi navê Atman (Osman) bidest xist. Ji Çemê Sakaryayê heta Paphlagoniyayê kurên Amuriosî(Umûr Beg) di navbera xwe de parvekir.[14] Pachyméres, li dereka din, encamên balkêş ên ku Romayîyan, li başûr; li Deryaya Sipî û Deryaya Egeyê ji bo rasyonîzekirina hêza xwe ya deryayî gelek yekîneyên deryayî belavkir radixê ber çavan. Ji bo ku Bizansiyên gelek tersxane (wargeh û binkeyên keştiyên eskerî û bazirganî) hilweşandin, bi koman deryavanên Xiristiyan bêkar man. Berpirsên Menteşayîyan ji van îstîfade kir û donanmayek (beşa deryayî ya eskerî) ava kir, ji aliyekî ve jî wan li deryayê dest bi korsaniyê kir.

Pachyméres, bi kêmasî beşekê ji wan wek deryavanên Persî bi nav dike. Gava ew bi giştî behsa êrişên Misilmanan ên ser giravan yê di riyên deryayê re dike, diyar dike ku demekê wan deryavanên Persî şandin giravên Kykladê û van korsanan bi êrişên xwe, ew girav bêînsan hiştin:

Her roj, ne tenê ji aliyekî ve, ji hemû aliyan ve xeberên xerab dihatin. Ne tenê di bejayiyê de, bi korsaniya di deryayê de jî, berê, wan girava Tenedosê bi êriş girt. Li wê derê gelek îşkence kirin û paşde vegehiyan. Wê demê hinên din jî geh bi tirsandin geh bi razîkirin deryavanên Persî yê ku li wê derê bûn şandin Kyklatan û miameleyên xerab kirin; bi gemiyên xwe hicûmî hem Saqizê, hem Sîsamê, hem Kapathosê, hem jî Rodosê û gelek derên din kirin û xelk ji warên wan qewirandin.[15] Di vê demê de li Rodosê korsanekî bi navê Kurdoglu navûdeng da.

Nivîsandinên bi kêmasî sê Bizansiyên; yê dîroknivîs Georges Pachyméres û Nickephorus Gregoras û kâtibe Dêra Johannesê a Ephesusê Paulus Aeginete radixin ber çavan ku yê warên rojava û başûrê rojavayê Anadoluyê heta Deşta Menderesê, Efesê, Tireyê û Bîrgiyê bi dest xistin, Germiyânî û Menteşayî bûn. Ev ne Tirk bûn, Persî dihatin zanîn. Ev nivîs, wekî destnivîsên hevdemê buyerên herî kevn in ku gihastine me, ew piştgiriyê didin wan destnivîs û belgîyên ku dinivîsin Menteşayî û Germiyânî Kurd in.

Ji bo ku xebata me xwe bi behsa *Kurdtiya Menteşayiyân* sînordar kiriye, em ê behsa wan agahî, belge û nivîsên ku Kurdtiya wan eşkere binavdikin, yên destekê didinê bikin û bi vî awayî dawiyê li nivîsa xwe binin.

AGAHIYÊN DÎN ÊN KU KURDTIYA MENTEŞAYIYAN EŞKERE DÎKÎN

Menteşa, emîr sevhîlekî (mîrê peravan) Selçûqiyên Rûmê bû. [16] Bav û bapîrên wî li peravên Deryaya Egeyê wek emîr sevhîlên sultanên Selçûqî berpirsiyarî hildabûn ser milên xwe û wek xwedanê erdên ku îro dikevin nav wîlayetên Tirkîyeyê Aydın û Muxlayê bûn. Bavê Menteşa Begê damezrênerê Mîrekiya Menteşa, ew Emîr Bahaeddîn e ku di *Qeremnameya Şikarî* de bi navê *Hacî Bahaddînê Kurdî* [17], di Selçûqnameya İbn Bîbî de *Melîk'ul Sevhîl Emîr Bahaeddîn Muhammed* [18] tê binavkirin. Emîr *Hacî Bahaddînê Kurdî* di serihildana Mehemed Begê Qeremanî de yê ku Qonya zeft kir û bû sebebê rûdana Cîmrî, bi parastina Qonyaya paytexta Selçûqiyân berpirs bû û bi hêzeka hindik li hundurê bajarê Qonyayê bû. Wê demê ji bal Mehemed Begê Qeremanî yê ku bajar zeft kiribû li gel yek du emîrên din hat kuştin. Piştî kuştina Emîr Bahaeddîn, kurê wî Menteşa li şûna bavê xwe bû emîr sevhîl. Li gor îdiaya Şikarî, *Hacî Bahaddînê Kurdî* di destpêkê de emîrê Sêwasê bû. Kurê wî Menteşa jî wê demê li ser sefereka mezin a bavê xwe li şûna wî bi wekîltî Sêwas îdare dikir. Li gor Şikarî ji ber cazîbeya warên zozanî yên çêrê bapîrê pêşîn ê naskirî yê Qeremaniyan Nûreddîn (Piştî mîreki jî kurê xwe Qereman Beg re hişt, ew bi xwe çû bû mirîde Baba İlyas û wek Nûre Sofî hat naskirin) di dema nebûna Hacî Bahaddînê Kurdî û wekîltiya Menteşa Begê gênc de bi hîle bajar xist destê xwe. Menteşa xapand kêşa aliye xwe û ew wek begê tabîê xwe teyinî Sêwasê kir. Menteşa jî bavê xwe re got ku rewşê qebûl bike, bixêrtirîn encam ê ev be. Hacî Bahaddînê Kurdî jî êdî ji mecbûrî qebûl kir ku Sêwas bibe bajarekî ser bi Qeremaniyan ve. Ji vir pê de Şikarî, Hacî Bahaddînê Kurdî û kurê wî Menteşa Beg li peravên Deryaya Egeyê wek hevkarê Qeremaniyan dinasîne.

Lê qasî ku tê fahmkirin, ew hin rûdanên li deverên cuda yên di demên cuda de ji bal qehremanên cuda ve kirî tevîhev dike û bi mihaweleya pesindayin û mezinkirina Qeremaniyan hin vebêjên xwe bi xwe durust kirine û şaşîtiyên giring jî kirine.

Weka me bi xwesipartineka çavkaniyên Bîzansî di nasandina Germiyanî û Menteşayiyên li rojavayê û başûrê rojavayê Anadoluyê nîşan da, ya nêzî aqilan ew e ku Hacî Bahaddînê Kurdî ji bal sultanên Selçûqî [19] ve hê gelek berê li peravên Deryaya Egeyê wekî melîk'ul sevhîl hatibe danîn û ew ne ser bi Qeremaniyan ve be, ku ew bi xwe jî mîrekiyeka Selçûqiyân bûn, lê emîreki rasterast tabîê sultan be. Heta gava Mehemed Begê Qeremanî rûdana Cîmrî derxist, Emîr Bahaeddîn Muhammed bi parastina Qonyayê wezîfedar bû û di dema serihildanê de ji bal Qeremaniyan ve hat kuştin (Buyera Cîmrî û loma tarîxa mirina Emîr Bahaeddînê Kurdî 1277 e), kurê wî Menteşa ket şûna wî.

Di *Menaqîbên Arîfan* (*Arîflerî Menkîbelerî*) ya Ahmed Eflakî de, menqîbeyên ku behsa peywendiyên Sultan Weledê kurê Mewlana Celaleddînê Rûmî û kurê wî Arîf Çelebî yên li gel mîrên Menteşa, yên Germiyan û yên Aydinîyan dikin hene. Pêwendiyên di van menqîbeyan de bahskirî li gel li ser Menteşa Beg, Yaqûb Begê Yekê yê kurê Alîşêrê Germiyanî û Mehemed Begê Aydinî ne û li gel çavkaniyên Bîzansî lihevhatî ne.

Rêkûpêktirîn xebata li ser şecereya begên Menteşayî jî bal Paul Wittek ve hatiye kirin [20]. Wî xwe sipartîye çavkaniyên Bîzansî, Şikarî, Munecimbaşî, Ahmed Eflakî û kronîkên din yên wek van, her wiha li kitabeyên li ser kêlên gorrên begên Menteşayî û yên li ser eseren mîmarî yên wan şecereyek derxistiye. Wittek, gazinan dike ku nivîsên kitabeyan ew qas mehiyane û têkilhev bûne ku gelek caran nayên xwendin, silsile û navên li ser wan her gav li gel hev ne lêhatî ne. Di rastiyê de meriv bi xwe jî gava yên ku wî qerar daye ku rast xwendiyê dibîne, diyar dibe ku wî ew jî rast nexwendine.

Wittek, tevî van dijiwariyan qebûl dike ku hew Hacî Bahaddînê Kurdî yê ku navê wî di *Qeremnameya Şikarî* de derbas dibe wek navê bavê Menteşa yê herî nêzî rastiyan e, lê piştî de wê şecereya ku ew dikêşe de bi awayekî balkêş cih nade vî navî. [21]

Wittek, du-diliya xwe ya li ser navê Hacî Bahaddînê Kurdî dispêre du sedeman. Ya yekê; ev nav di nusxayên destnivîsên yê *Qeremnameya Şikarî* yên ku hemû jî piştî hatine îstînsahkirin de, carina Hacî Bahaddîn, carina jî Hacî Bahadır derbas dibe. Ya duyê jî Şikarî hin buyeran dike karên Hacî Bahaddîn ku di esasî de piştî wî, piştî 1277-ê rûdane, heta buyerên salên 1290-ân, yên 1300-a ne.

Bêguman ev herdu sedemên dudiliyê dikarin bèn zelalkirin. Derbasbûna navên *Hacî Bahadîn* û *Hacî Bahadır* ne ji ber hebûna du kesên cuda ne, lê ji wê ne ku di alfabe ya erebî de ya yekê bi 'ح' (nûnê), ya din bi 'ج' (rêyê) xelas dibe. Di destnivîsan de ferqa graffîkî ya navbera


wan tenê xalek(noxtetek) e. Gava xala di nûnê de li serê neyê danîn an bê jibîrkirin, yan bimehe ew ê wek rê bê xwendin. Loma di dema îstînsahkirinan (jiber nivîsandinan) de her ji bo eynî şexsî carina Bahaddîn û carinan jî Bahadır hatiye xwendin û nivîsîn. Sedemê duyê jî ew e ku tê fahmkirin ku ne Şikkarî, ne jî Wittek, ji bilî bapîrê Menteşayîyan Hacî Bahaddînê Kurdî, hay jî Emîr Bahaeddîn Kurdê mîrê Mîrekiya Kurd a Amasyayê ya serbixwe nîne ku yek du deh salan piştî Hacî Bahaddînê Kurdî hatiye. Me di xebata xw ya bi navê *Amasya Bağımsız Kürt Emîrliği (Emareta Kurd a Amasyayê ya Serbixwe)* [22] de, cihekî fireh daye jiyan û dema *Mîrê Amasyayê Bahaeddin Kurd*. Kurd Beg, di dawîya sedsala 13-ê û nivê pêşîn ê sedsala 14-ê de buye mîrê Amasyayê, yê Qeyseriyê, berî wan li Sêwas, Amasya û Qeyseriyê emîrtî, walîtî û wezîrtiya Mîrekiya Eretnayîyan kiriye.

Tevî ku Şikarî di berhema xwe de li hin cihan navê Kurd Beg, Hacî Qutlu(Kutlu) Şah îbn Kurd û Xwace Alî dide jî bi genaeta me ew wan nasnake, bes di beşê pêşî yê esera xwe de ku esas ew wergerên ji Farişî ên ser bi Tirkî yên beşên menzûm ên Yarîcanî û Dehannî ne, ji wan neqil kiriye lê ji bo ku baş nas nake bapîrê Menteşayîyan Hacî Bahaddînê Kurdî û Mîrê Amasyayê Emîr Bahaddîn Kurd têkilhev dike [23] Karên ku Emîr Bahaddîn Kurd, piştî mirina Hacî Bahaddînê Kurdî yanî piştî 1277-ê dike wan jî dike yên bapîrê Menteşayîyan. Gava ew bèn naskirin û fahm bibe ku ev nav yên du mîrên kurd ên cuda ne, buyer hê zelaltir li ciyên xwe rûdinên û ew sedemên ku Wittekî dixin nav gumanan ji meydanê radibin. Rewşeka din jî heye ku diyar e Paul Wittek dixe nav dudiliyan. Di kîtabeya ser kêla gorra Ahmed Gazî îbn Îbrahîm Beg ê mîrê Menteşayîyan ê ji demen dawiyê de ku di sala 793/1391-ê de hatiye çikandin, navin li serê hene ku li gel navên standard yên şecereya wî li hev nakin. Kîtabe wiha ye: *Ahmed Gazî îbn Îbrahîm, îbn Orxan (Orhan), îbn Mesûd, îbn Menteşa, îbn Eblîstan, îbn Karabay*. Wek tê dîtîn li gel navê naskirî yê Menteşa hin navên balkêş (Eblîstan, Karabay) hene, lê navê Hacî Bahaddînê Kurdî tune. Ger hebûna muhtemelen ê wek Muhammed Beg derbas bûya. Li şûna bavê Menteşa “Eblîstan” heye.

Em Eblîstanê wek navê kevn ê bajarê Elbîstana ser bi Meraşê ve dizanin. Îsmail Hakkî Uzunçarşılıoğlu jî ji bo Eblîstanê wiha dinivîse: *“Navê Eblîstanê şayanê dîqetê ye. Navê berê yê Elbîstana îro ya qezaya wilayeta Maraşê Eblîstin bû. Gelo ev navê memleket di eynî wextê de navê kesan e jî? Di sedsalên 14-ê û 15-ê de, di tarîxê de rastî navên kesan ên wek Dîmşiq, Misir, Bexdad, Mardîn, Isfahan jî tèn. Loma navê di kîtabeyê de navê kesan e”* [24] Her wiha, berî kîtabeya li jorê, di kîtabeya li ser Mizgefta Ahmed Gazî de ya ku li Mîlasê hatibû avakirin, ku sala 780/1378-ê hatibû nivîsîn, şecereyeka cudatir heye *“Vê mizgefta mezin Emîrê ezîm û sultanê mukrî malike rikaba qewman, sultanê hukumdarên Ereb û Eceman* [25], *Ahmed Gazî Beg –Xwedê jiyê wî dirêj bike– îbn merhûm û maxfûr şehîdê bextewer İbrahim Beg bin Orhan, bin Mesûd, bin Eblîstan avakiriye”*. Ciyê balkêşiyê ye ku li vê derê hem di ya dema hê saxiya Ahmed Gazî de, hem di ya ser kêla gorra wî de, bapîrê pêşîn Karabay (Karabay) tune. Hê balkêştir, navê demzrênerê mîrekiyê Menteşa jî tune. Di kîtabeyên dorkenarê deriyên hilkişiyana ser mîhraba vê mizgeftê de jî, her ew şecere heye. [26] Wittek, li ser aghiyeke li gel dîroknivîsê Bizansî jî dikeve gumanê. Balê dikêşe serê ku Pachyméres behsa kesekî bi navê *‘Karmanos Alisurios’* dike û jî vê, encama navê Alîşêrê Germiyânî derdixe. Lê li dereka din, ji nivîsandina *‘Karmanos Mantachiyas’* şîroveyeka din dike û dinivîse ku meriv nikare bigihîje wê encamê *‘Karmanos’* ê wek *‘Germiyan’* fahm bike, ev ne mimkin e dibêje. [27] Çima? Çimkî yekî Menteşayî ye. Esas gelek siriştî ye ku civakên di nav hev de, li gel hev, yan cîran navên naskiriyên hevdu bidin zarokên xwe, lê em wê bidin aliyekî. Li gor Wittek, ev pirtir dikare bi navê *Qereman (Karaman)* re wek hev be yê ku di salnameya dewletê ya Kalkaşandî ya di 1412-ê de temamkirî de wiha derbas dibe *“El Emîr Zerwan îbn Karaman îbn Menteşa”* (الاميرذروان بن کرمان بن منتشا). Wittek jî vir tevdigere û wek bapîrê Menteşayîyan biryarê li ser navê *Qereman* dide, vî navî di şecereya xwe de bicih dike. Helbet Wittek, di eynî wextê de awayê erebînivîsandiya teksta Kalkaşandî jî dide. Ji vê jî fahm dibe ku ne mimkin e wî qesda navê *Qereman (Karaman)* kiribe. Ya ku di Tirkîya îro de wek *‘Karaman’* tê nivîsîn, li gor elfabeya Erebî divê wek *‘Qereman (قرمان)’* hatibe nivîsandin. Kalkaşandî *“El Emîr Zerwan îbn Kirman/Karman (ne Karaman jî) îbn Menteşa”* nivîsîye. Nav, bi misogerî, hem di Pachyméres, hem di Kalkaşandî de *‘Karmanos/Karman/Kirman’* e. Ya divê ev wek *‘Germiyan’*, ya jî wek nivîsandî *‘Karman/Kirman’* bê qebûlkirin, tu riyeka din tune. Ji xwe di dîrokê de peyva *‘Kirman/Karman’* ya ku buye nav ji însanan re heye. *Karman Şah*, piştî buye *Kermanşah / Kirmanşah’*. Eger bê bibîranîn ku di qirnê navîn de, beşeka

giring a Kurdan ku hatine Anadoluya navîn û rojava ji derûdora Şarezor/Germiyana Kurdistana Iraqê ya nuha û Kirman /Kirmanşah/Loristana Kurdistana Îranê ya nuha hatine, navên ‘Germiyan’ yan jî ‘Karman/Kirman/Kerman’ maqûltir in.

Ji teksta kîtabeya ku Wittek di kitêba xwe de daye, fahm dibe ku wî kîtabeya ser kêla gorra Ahmed Gazi Beg jî şaş xwendiyê gava gotiyê *Karabay*. Li gor teksta erebî ne mimkin e ku ev gotin wek ‘Karabay, Qarabay’ bê xwendin. Belkî ‘Kurbî Beg/Qurbî Beg/Kurî Beg’, hetta ‘Q[a]zi Beg’ bê xwendin. Wittek bi xwe dinivîse ku kîtabe zêde mehiyaye, derfeta xwendin û bişaftineka zelal nade. Tevî vê jî balkêş e, ev nav wek ‘Karabay’ xistiye dawîya şecereyê. Îsmail Hakî Uzunçarşılıoğlu jî dinivîse ku “her çendî Doktor P. Wittek ev nav wek Karabay Bey xwendiyê jî di kîtabeyên beşê duyê de wek *Kuri* yan *Kari* Bey hatiye xwendin”. Uzunçarşılıoğlu bi xwe jî nekariye bixwîne.



Kîtabeya li ser kêla gorra Ahmed Gazî Beg. Ji kitêba Wittek

Piştî van zelalkirinan, dimîne gotina ‘*Eblistan*’ ku vê kîtabeya dikeve dema serdestiya Osmaniyan dikare wek ‘*Eblistanî*’ jî bê xwendin. Belkî hê rasttir welê bê xwendin. Di kitêbên berê de yên bi Osmanî û Erebi, ya bi navê ‘hurûfê îmla’ ku nedihat nivîsîn lê dihat xwendin. Hin dîroknivîsên Tirk û Osmanî jî bo ku ev qaîde li ber çavan negirtine, ‘Germiyanî’ wek ‘Germiyan’ yan jî ‘Germiyan Begi(Begê Germiyanê) wek ‘Germiyan Beg’ xwendine. Bi vî awayî dikare navê ‘*Eblistanî*’ (*Elbistanî*) bi maneya “yê ji *Eblistanê/Elbistanê*”, ev xanedanî bi bajarê *Elbistanê* yê ku di dewra Îslamê de wek bajarekî Kurdan ê avadan bû, bê pêwendîdar kirin. Lê ya qencitirîn ew e ku meriv şecereyên kîtabeyên di dewra serdestiya Osmaniyan de, di dewra entegrebûna bi wan re de, fahm bike ku bi zanebûn hin navên rastîn ên şecereyê nehatine nivîsîn hin navên nerast û nelêhatî hatine nivîsîn. Revîzekirina şecereyan li gor dem û dewranan li seranserê dunyayê li nik hemû xanedaniyan heye.

Hema hema temamiya Kurdên ku hatine Anadouya rojava û navîn, berê hatine deverên Suriyeyê; Şam û Helebê, ba Eyyubîyan, piştî jî wan deran belavî deverên Meraş, Elbistan, Malatya û Sêwasê, hetta Qeyseriyê û Amasyayê bûne, gav bi gav li wan deverên Anadoluya rojava û navîn ên bahskirî bicih bûne.

Ne ecêb e ku Hacı Bahaddîne Kurdî yan bapîrekî wî yê bi navê Qurbi/Qurbi/Q[a]zi Beg jî *Elbistanê* be. Ji xwe destpêka jiyana Melîku’l sevhil Emîr Bahaeddîn Muhammed li Sêwasê derbas buye.

Bi vî awayî, eger ê şecereyek jî bo xanedaniya Menteşayîyan bê danîn, Qarabay/Karabay û Karaman/Quereman Begê ku Wittek wan bi nav dîke divê bîn avêtin rexeke, muhtemelen şecereyeka wiha bê avakirin:

Quri/Qurbi/Qazi Beg, kurê wî *Eblistanî* Beg/Emîr Hacı Bahaeddîn Muhammedê Kurdî, kurê wî Menteşa Beg, kurê wî Kirman (Karmanos/Germiyan) Beg, kurê wî Mesûd Beg, kurê wî Orhan Beg, kurê wî İbrahîm Beg, kurên wî Mûsa, Muhammed û Ahmed Gazî Beg, (piştî Ahmed Gazî biryê wî) Muhammed Beg, kurê wî İlyas Beg, kurên wî Ahmed û Leys Beg. Kurê Ahmed İlyas Beg. Divê neyê jibîrkirin ku hinek xelekên di navê de zeif in.

Ji alî behsa me ve yê giringtirîn, Emîr Hacî Bahaddînê Kurdî (Melîku'l sevhîl Bahaeddîn Muhammed) ê ku Mîrekiya peravan ya tabîê sultanên Selçûqî kir û Menteşa Begê ku serbixweyiya vê mîrekiyê îlan kir û navê xwe lê kir...

Ji bo ku di vê xebatê de aramanca esasî *Kurdtiya Menteşayîyan* e ê zêdetir cih neyê dayin dîroka wan, ê li ser eslê wan ê etnîkî bê temerkuzbuyîn/întensîvbuyîn.
PEYWENDIYÊN NAVÊ MENTEŞA YÊN BI KURDEWARÎYÊ RE

Wittek, di mesela Menteşa de ew qas reşbîn tevgeriyaye ku biryar nedaye gelo ew navê însan, eşîr an deverêkê ye. Lê bi lêhûrbûneka ne zêde kûr derdikeve ku Menteşa navekî însanan ê hevedudanî yê ji du peyvyan e.

Navê “Menteşa” wek navê însanan û pêwendîdar bi civak û dîroka Kurdewarî re bi rêkûpêkî Şeref Xan, di *Şerefnameyê* de gava behsa Mîrên Kilîsê dike, dide:
“Li gor ku dibêjin [Hukumdarên Kilîsê], li ser esasê rîwayeta rast pismamên (kurmamên) hukumdarên Hakkâriyê û Îmadiyeyê ne. Ev, sê bira bûn û navên wan Şemseddîn, Bahaddîn û Menteşa bû. Hukumdarên Hekkâriyê ji nesla Şemseddînê ne û ji bal Kurdan ve ji van re ‘Şemû’ tê gotin; ji hukumdarên Îmadiyeyê yên ji nesla Bahaddînê tên re ‘Behdin[î]’ tê gotin; em bên ser hukumdarên Kilîsê jî, ew ji nesla Menteşa ne û ji wan re ‘Mend’ tê gotin.

Ji rîwayetên curbicur kîjan rast be jî, Mend di destpêkê de biserket eşîreka Kurdan li dora xwe civand û li gel wan çû Şam û Misrê, ket xizmeta hukumdarên Eyubîyan. Wan jî nehiya Quseyrê ya nêzî Wîlayeta Antaqayê da wî. Mend û merivên xwe zifistanê li vê derê bicîbûn. Bi vê jî nema; civakeka Kurdên Êzîdî yên ku hê ji berê de li van diyaran cîwar bûbûn, li dora Mend civiyan. Vê jî rê vekir ku roj bi roj şan û şerefa wî bilind bibe, nifûza wî zêdetir bibe. Ji her derê Kurd hatin ba wî. Her wiha Kurdên li derûdora Cûnê û Kilîsê cîwarbuyî jî tevî wî bûn.

Hukumdarên muezzem ên Alê Eyyub bala xwe danê û ew kirin mîrêmîranê hemû Kurdên li Şam û Helebê; di îdarekirina vê civakê de û biryardan û çareserkirina meseleyên wan de, ew bi her awayî serbest hiştin. Bi vî awayî ew hilkişandin bilindtirîn meqamê îdarî û eskerî. Di destpêkê de şêxên Kurdên Êzîdî yên li navbera Meraş û Hemayê berfirehbûyî, li ser van meqaman pê re pevçûn. Vê rewşê rê vekir ku dem bi dem şûr bên kêşan û şer ji derkevin. Lê Mend li hemberê wan biserket; geh bi dijwarî û reqî, geh bi nermî, geh bi zixtan û geh bi qenciyan ew kirin tabî'ên xwe. Di dawiyê de gihast xweziya xwe û hemû Kurdên li wan diyaran stu li ber hukumdariya wî ya mutleq tewandin.

Ku Mend mir, kurê wî Erebbeg ket şûna wî. Piştî wî jî kurê wî Emîr Cemal îdare girt destê xwe. Piştî mirina wî jî kurê wî Ahmed Beg ket şûna wî. Di dema vî begî de dawî li rojên Alê Eyub hat û dewleta wan a mezin ket destê Çerkezên Memlukî. Lê Ahmed Beg huştu li ber dewleta Çerkezan netewend û rojên xwe wek hukumdarekî serbixwe derbas kirin. Di dawiyê de du kur li pey xwe hiştin û mir.”^[28]

Tarîxa mîrên Kilîsê di *Şerefnameyê* de ji vir pê ve jî Canpolatan jî digire nav xwe û berdeham dike, lê j bo ku pêwendîya wê li gel behsa me tune, em li vê derê dibirrin, qîma xwe bi vî qasî tînin.

Ji agahiyên ku Şeref Xan dide tê fahmkirin ku *Menteşa* navê mîrekî ye, Kurd bi navê *Mend gazî* vî mîrî dikin, ew di dema xwe de ji devera Botan li gel eşîra xwe çuye ketiye xizmeta Eyubîyan, wan li devera Antaqayê mîrekî daye wî. Ji ber serkeftina mîrê bi navê Mend civaka (eşîra) li pey wî, hetta xanewadeya hukumdarên Kilîsê bi navê Mend[î] tên naskirin.

Berî ku Mend, li devera Antaqayê bicî bibe, li wê derê Kurd, bi taybetî Kurdên Êzîdî weka civak hene. Ku Mend bi ser dikeve hem Kurdên misilman ên derûdora Cûn û Kilîsê, hem jî Kurdên Êzîdî li dor wî dicivin, dibin yek. Piştî, sultanên Eyubî wî wek mîrêmîran li ser serê hemû Kurdên Heleb û Şamê (teqrîben erdên bakurê Suriyeya nuha, Şam û Libnanê) tayin dikin. Hêz û serweriya Mend ji Meraşê heta Hemayê berfireh dibe.

Di dîrokê de, Kurdên ku ji deverên Mûsilê, Şengalê, Şarezorê, Germiyanê û Loristanê çûne rojava ber bi erdên Bizansê (Romayê) de, ji bo ku zincîreçiyayên Zagrosan, Torosên rojhilatê, zozanên wan ên bilind û geliyên teng û kûr û li gel van çemên Firatê, yê Mûradê, yê Dicleyê û yên Zapê rê nedidan, riyên wan di zozanên nizm, deşt û berriyên Germiyanê, Şarezorê,

Mûsilê, Mêrdînê, Herranê, Urfayê, Halebê û quntarên başûr ên dirêjeyên wan zincîreçiyayên binavkirî; Cûdî, Şengal û hwd. re derbas bûne.

Kurdan ji başûrê Îrana îro, rojhilat û rojhilatê bakurê Iraqê, ev güzergâh şopandine hatine erd û peravên bixêrûbêr yê Sûriyeyê, Halebê, Şamê û Antakyayê. Ji vê derê ji aliyekî ve başûr; Libnan, Filistîn, Misir û Yemen, ji aliye din ve deverên bakur û rojhilatê Antakyayê; deverên Kilîsê, Elbistanê, Meraşê, Meletiyeyê, Sêwasê, Qeyserîyê, Amasyeyê, Toqatê, Kutaxyayê, Qestemonûyê, Anqereyê û Sînobê hedef girtine, yan jî Edene, Antalya, Qonya kirine qonaxên navîn û derbasî devera Egeyê bûne.

Deverên bakurê Şam û Helebê, rojhilatê û bakurê Antakyayê, warên qonaxên yekê ne. Li van deran bajarên navdayî, bûne cih, war û navendên pêşîn ên rûniştîyên û birêveberiyên Kurd û Misilmanan.

Esas îstîlayên Ereban ên destpêkê ji van guzergahan çûne nav erdên Împaratoriya Romayê, heta ber hîsarên Îstanbulê. Piştî, pêlên îstîlayên Tirkmenên Oxuz û yê Moxolan yê di ser başûrê Îranê, Îraqa Ecem û Îraqa Ereb re hatî jî ev guzergah û qonax şopandine. Ev nexşerê, mecbûriyetek bû ku şertên cografî û siriştî yê dinyaya wê demê ferz dikirin.

Loma jî, di çavkaniyên Îslamê yê qirnê navîn de, ku behsa hem berfirehbûna Îslamê, hem jî ya Îstîlayên Oxuz-Tirkmen û Moxoliyan dikirin, rasthatina li mîr û fermandeyên Kurdan li deverên Meraşê, Xarputê, Elbistanê, Sêwasê, Qeyserîyê, Amasyayê, Toqatê û piştî Kutaxyayê, Qestemonuyê, Sînobê, Aydinê û Muxlayê ne ciyê şaşmayinê ye.

Em li vê derê, careka din navekî bibîrxin ku me di beşê derbasbûyê yê ve xebatê de gava behsa kuştina Suleyman Şah ya di sala 1086-ê de di şerê li hember Tutuş de li devera Antaqya û Helebê kir, me behsa wî kiribû. Îbnî Bîbî û Yazicizade Alî behsa wî navî kiribû; *Mende Beg/EmîrMende* yê ku hê jî Toqadê tevî emîrên din, li gel Suleyman Şah bû, mil bi mil pê re diket şeran û gava Suleyman Şah hat kuştin kurê wî Qilicarslan li gel mîrên din li ser text danî. Mend Begê ku Şeref Xan û Mende Beg/Emîr Mende yê ku Îbnî Bîbî û Yazicizade didin, bi genaeta me her eynî nav in. Li gor zanînen di dest de helbet têrê nake bê îdîa kirin ku eynî şexsiyet in. Çimkî Mend Begê ku Şeref Xan bahs dike li gel tarîxeka hê piştretir; ya bi kêmasî qirnek piştîre ye ku Eyubî bûbûn împaratorî. Lê herdu nav eynî ne. Bi mane û balkêş e, her wiha nîşaneka giring a şopbiriye ye ku ev herdu kesayetî di her eynî deverê de derketine ser sahnaya tarîxê, ji wê derê ber bi bakur ve çûne. Helbet Menteşayê kurê Hacî Bahaddînê Kurdî û ev herdu Mend jî kesayetiyên cuda ne. Menteşa gelek piştî wan jiyaye. Lê ev ji bo me wê yekê jî derdixe ku gava hê Menteşa derneketibû ser sehneya tarîxê, navên Mend û Menteşa li nav Kurdan berbelav bûn, heta xanedaniya Mendan pêkhatibû û ve xanedaniyê li deverên Antakyayê, Kilîsê, Meraşê, Helebê û Hemayê serwerî dikir. Şexs dikarin ne yek bin, lê bi hêsanî mimkin e ku bapîrên wî mîrê ku li başûrê rojavayê Anadoluyê, li Egeyê derket meydanê û dewleta Menteşayî danî, bapîrên wî yê ku hê pêşdetir li Sêwasê serwerî dikirin di demên berêtir de Elbistan û hin deverên din ên wan deran îdare kiribin, heta ew ji eslê xanedaniya Mend bin, parçeyek ji wê bin.

Li gor zanîna me pêşkêşkirî, ew encamên ku em gihîştinê ev in; eslê gotina Menteşa 'Mend/e' e. Mend/e di destpêkê de bi asta meqamê beg/mîrtiyê navê xwe daye naskirin; *Mend/e Beg, Emîr Mend/e*. Lê ku Mend/e Beg, bi rutbeya beglerbegiyê (mîrêmîran) dest bi serweriya li ser gelek eyaletan û mîrekiyan kir, bû Mend/e Şah.^[29] Di xebata me ya bi navê 'Amasya Bağimsız Kürt Emirliği' (Emareta Kurd a Amasyayê ya Serbixwe) de me dît ku gava Hacî Qutlu (Kutlu) Begê kurê Emîr Bahaeddîn Kurd bû emîrê Amasyayê navê Hacî Qutlu (Kutlu) Şah lê hat kirin. Me dît, Mend Begê ku Şeref Xan behsa wî dike, piştî bû mîrêmîranê (beglerbegiyê) hemû Kurdên ji Hemayê heta Meraşê, yanî bû 'şah/xan'.

Navê *Mende Şah*, bi demê re ku meşhûr buye, hatiye hezkirin, li derûdorên xanedaniyê hatiye hevghandin û wekî nav li însanan hatiye kirin; *Mendeşah[h]*. Piştî bi demê re nav sivik buye guheriye 'Menteşa'. Ji xwe, Şeref Xan jî Şerefname gelek piştî van mîran, di 1597-ê de nivîsiye. Di wê demê de îdî navê *Mendeşah* li her derê guherîbû bûbû *Menteşa*, di berhema wî de jî bi vî halê xwe yê sivikbuyî cih digire.

Navê Şeref Xan bi xwe jî di demên piştî de pêrgiyê guhertineka bi vî awayî buye. Navê wî Şeref (Şerefeddîn) e. Wî nîşana Xan-tiyê hê gava li Îranê bû, di dema Şah Tahmasp de gava bû

mîrêmîran (beglerbegî) wergirtiye û ew wek Şeref Xan hatiye binavkirin. Lê piştire, di dema me de jî ev nav û nîşan hatine biyekkirin û wek navê *Şerefxan* li însanan hatiye kirin. Di encamê de qenaeta me ew e ku li gor agahî û belgeyên pêşkêşkirî bi hêsanî meriv dikare bigihîje wê encamê ku xanedaniya Menteşayîyan Kurd e. Teb'ayên mîrekiyê, civakên bin serweriya xanedaniyê, wek hemû mîrekî û dewletên dema qirnê navîn li Mîrekiya Menteşa jî ji civakên xwedan etnîsîteyên cuda pêkhatibûn. Wek Misilman Kurd, Tirkmen, Moxol, Xwarezmî, Ereb û Faris, Ermenî û Rumên misilmanbuyî hebûn. Helbet Rum, Ermenî, Gurcî, Yahûdî, Suryanî-Asûrî, Latîn û Frenkên ji Rojava hatî jî hebûn.

Ev xanedanî, li Anadoluya rojava û navîn, di nav dewleta Selçûqiyên Rûmê de bû ku xanedaniyeka Tirkmen serwerê wê bû. Pirraniya emîr, beg, rêvebir, esker û eşîran Tirkmen bûn, bi wan re di kefteleftê de bûn. Hê ji destpêkê de li gel zimanê xwe Kurdî, Farisî û Erebî, Tirkî, hetta Rumî di jiyana xwe ya rojane de bi berfirehî bikar anîne, ev bi asanî dikare bê fikirîn. Ew bi van zimanan, civakên ji kultura van civakan heşirneşir bûne. Bi taybetî di dema serdestiya Osmaniyan de ku zora hemî mîrekiyên deverê bir û ew kirin beşek ji xwe, bi taybetî ku bi giştî dev ji Farisî û Erebî hat berdan, endamên xanedaniya Menteşa jî pirtir bi derûdorên rêvebir ên Osmaniyan re û bi Tirkan re entegre bûn.

Lê qasî ku em tê digihîjin, heta salên destpêkê ên Cumhuriyeta Tirkîyeyê Kurdiya xwe zanîne, beşeka giring a wan, bi taybetî tebeqa rêvebir, zimanê xwe jibîr kiribin jî eşîrên Kurd ên ser bi wan ve û Kurdên wan ên cîwarbuyî Kurdî jibîr nekirine, di jiyana gundewarî û nîvkoçeriyê de Kurdiya xwe bikaranîne.

Di rojên me yê nuha de jî, li Anadoluya rojava û navîn beşekî giring ê nifûsa ku bi Kurdî diaxive ji wan Kurdên wê demê ne. Yê ku îdî bi Tirkî diaxivin jî zanin ku bi eslê xwe Kurd in. Lê ji bo ku li ser dîroka wan, xebatên ciddî yê ilmî tunene, gelek caran agahiyên ji guhan bihistî didin, dîroka yê cara pêşîn hatî û yê piştire bi pêlên cuda yê koçberî û sirgûnan hatî tîrên tîkilhevîkirin, nezanîne perdeya xwe vegirtiye ser vê diyardeyê.

[1] Tirkmen, gotineka ji tîkilheviya Erebî û Farisî pêk hatiye, ew nav e ku Ereb û Îraniyan misilman li Oxuzên misilmanbûyî dikirin. Muhtemelen ji bo ku dînen xwe yê Şaman diterikandin û dibûn misilman, hem jî erdên xwe diterikandin û ber bi rojava ve koç dikirin dihatin, bi maneya "yên terkkir" Tirkmen dihat binavkirin. Yanî yê dîne xwe, ciîh û warên xwe terikandî.

[2] Esas tîgihandina Tirkmen bi maneya koçer, piştire derbasî lîteratura Osmaniyan jî buye. Herwekî tê dîtin, dem bi dem, ji eşîrên Kurd ên koçer re "Ekrad-ı Turkmən/ Türkmən Ekradı"(Kurdên Tirkmen) hatiye gotin.

[3] Li gor Paul Wittek, ev qeyd nikarin berî 1204-ê û piştî 1261-ê bin. Yanî di demeka nîvê yekê ê sedsala 13-ê de, yanî li dora sedsala berî Ebu'l Fîda hatine nivîsîn. Çimkî Adalia û Denizliya li wê deverê piştî 1204-ê tevî wan erdên bin desthilata Misilmana bû. Nikare piştî 1261-ê jî be, çimkî hemû ev erdên li başûrê rojhilatê Anadoluyê berî 1261-ê hatine fetihkirin. (Menteşa Beyliği -Mîrekiya Menteşa- r. 1)

[4] Li gor Wittek ev ew Akarîten şerkar ên Xiristiyan in ku li alî Bizansê hatibûn bicîkirin, awayek ji awayên wek şerkarên gazî yê Misilman bûn û erdên Romayê ji êrişên Misilmana diparastin. (Menteşa Beyliği -Mîrekiya Menteşa-, r. 9)

[5] Li gor Wittek, ev çem ne mimkin e ku ji Dalamançaya Îro pê ve tu çem be.

[6] Wergirtiyan Êbn Saîd ji cografyaya Ebu'l Fîda, veguhêz Paul Wittek, Menteşa Beyliği, r. 2.

[7] Pachymérés, I 222 û di B'ya dewama wê de. Veguhêz Wittek, Menteşa Beyliği, r. 16.

[8] Georges Pachymère, I S. 215 B, veguhêz Wittek r. 24

[9] G. Troickij, Imperatoris Michaelis Paleologi de vita sua opusculum etc. Petersburg 185 r. 7

[10] Pachymérés, I S. 472 û dewama wê. Wekî din, dîroknivîsekî din Nickephorus Gregoras I r. 142 B. Veguhêz Paul Wittek, Menteşa Beyliği, wergêr O. Ş. Gökyay, Weşanên TTK, Çapa 3-ê, 1999, r. 26-27

[11] Pachymérés, II s. 210 û dewama wê, veguhêz Wittek.

[12] Nickephorus Gregoras, I S. 214 B, veguhêz Wittek r. 38

[13] Paulus Aeginete, Yazmalar (Yên nivîsandî), Marciana 292, veguhêz Wittek r. 39. Li gor Dustûrnameyê Enverî, Begê Menteşayî Sasa ji bilî Tire û Ephesusê Bîrgî jî fethkir.

[14] Nickephorus Gregoras, I s. 214 B, veguhêz Wittek r. 17.

[15] Pachymérés, II, r. 343 û B ya dewama wê. Veguhêz Wittek r. 45.

[16] Selçûqiyên Rûmê ji yên ku li serhadên bejayiyan (li ser sînoran) mîrtî dikir re “uc beyi” yên li peravên deryayên vekirî mîrtî dikir re “emir sevahil, meliku’l sevahîl” (sahil beği)dihat gotin.

[17] Şikarî, Qeremname (Karamanname),

[18] İbn Bîbî (El Huseyin b. Muhammed b. Alî el-Caferî er-Rugadî) yê amadekir Prf. Dr. Mürsel Öztürk, Kùltür Bakanlıđı (Wezaretê Kulturê), 1996 Ankara

[19] Muhtemelen Alaeddînê Yekê yan jî kurê wî Xiyaseddin Keyxusrew.

[20] Paul Wittek, Menteşê Beyliđi r. 24-55, 132-153, 177.

[21] Esas neliheviyên wiha ku di berhema Wittek de hene pîr balkêş in. Ez gelek fikirîm ku gelo dibe ku tehrîfatên dema wergerandina wê ya ser zimanê Tirkî bin. Lê bi derfetên xwe yên şexsî min orîjînalê berhemê nedît û nekarî ez wan bidim berhev. Loma ez nikarin tiştêkî di vî warî de bejim.

[22] Murad Ali Ciwan, “Amasya Bađımsız Kürt

Emirliđi”, <https://muradciwan.com/2018/02/18/amasya-bagimsiz-kurd-emirliđi/>

[23] Karamanname, esas di sê qonaxan de ji bal sê kesan ve hatiye nivîsîn. Ev, Dehhânî, Yârîcanî û Şikarî ne.

Dehhânî ji bo Sultanê Selçûqiyê Rûmê Alaeddîn Keyqubadê III-ê (m. 1303) di terzê Şehnameya Şair Firdewsî de bi Farisî eserek nazm kiriye, di dawiya eserê de ji bo Qeremaniyan (Karamanoğulları) beşeka ji 600 beytan pêkhatî nivîsîsiye, lê berî ku vî beşî tamam bike miriye.

Li dor piştî sê çarîk qırnan, Alaeddîn Begê (1361-1397) Qeremanî ji şairekî bi navê Yârîcanî daxwaz kiriye ku ew ji ciyê ku Dehhânî nivîsîtiye û heta dema wî binivîse û tamam bike. Berhem bi Farisî bi awayekî nezm hatiye tamam kirin. Li dor 125 salan piştî Yârîcanî, diçaryeka duyê ya sedsala 16-ê de Şikarî berê beşên nezm ên bi Farisî yên van herdu şairan li gor xwe wergerandiye ser Tirkî, di beşê dawîn de jî wî bi xwe dewra dawîn û ya hilweşiyana Qeremaniyan lê zêde kiriye. Loma yên xwedan agahiyên sedsalên 13-ê û 14-ê Dehhânî û Yârîcanî ne, ne Şikarî. Loma ku ew di şertên bêderfetiye wê demê de wekî weqanivîsekî (kronîkorekî) mixalîfê yên Osmanî dibe ku wî agahî j du bahaeddînan tunebe.

[24] İ. Hakkı Uzunçarşılıođlu, Anadolu Beylikleri ve Akkoyunlu, Karakoyunlu Devletleri, Weşanên TTK, 1937, Ankara, r. 19-22.

[25] Yê ku Wittek wergêraye, uhtemelen ji bo li vê derê cardin pêrgiyê bibîrxistina Persan/İraniyan/Eceman nebe, gotina ‘Ecem’ rakiriye û wiha wergerandiye ‘Arap ve Arap olmayanların hükümdarlarının sultanı’.

[26] Wittek, Menteşê Beyliđi r. 132-145.

[27] Paul Wittek, Menteşê Beyliđi, r. 52.

[28]] Şeref Han, Şerefname Kürt Tarihi, Ant Yayınları, 1971, İstanbul, r. 248-249.

[29] Gotineka bi maneya meqam rutbe ye eslê wê İranî (Farisî, Kurdî) ye.